ENSTÎTUYA KURDÎ YA AMEDÊ
THE KURDISH INSTITUTE OF AMED
DİYARBAKIR KÜRT ENSTİTÜSÜ
2004

Ji raya gişti re,

Yek ji peywirên dewletên dinyaya pêşketî li kîjan erdnîgariyê dibe bila bibe, parastina ziman û çandên cuda, ayînên cûda, nêrîn û bîr û baweriyên cuda ye.

Weke dewlet Komara Tirkiyeyê li ser hîmê yekzimanî, yekala, yeknetewehiyê xwe ava kiribe û damezrandibe jî, ev xweserî mafê tunekirin, qirkirin û jiholêrakirina ziman, çand û ayînên di nava sînorên Tirkiyeyê de nade hikûmetan û her wiha nade tu dezgeh û saziyên dewletê

Li ser rûyê dinyayê ji gelê Kurd pêve kîjan gel di serdema îroyîn de ji hemû xweseriyên xwe yên mirovî, civakî neteweyî bêpar e? Di nava civaka mirovahiyê de, gel hene ku rêjeya wan bi qasî ya navçeyeke kurdan nayê; li pêş Neteweyên Yekbûyî serxwebûna xwe dadixuyînin, ala xwe ya neteweyî hildidin. Weke her mirovî her civat û her netewê divê ku gelê kurd jî xwediyê çarenûsa xwe be.

Di pêvajoyeke ku gelê kurd, bi kal û pîr, mêr û jin û zarokan ve li qadên xwepêşandanan dirûşmên ***'Em perwerdeyê bi zimanê xwe dixwazin'*** diqîrin de, li dadgehên ku qaşo cihê heq û hiqûq û dadê ne, bi hinceta ku nivîskarekî kurd di mîtîngê de axiviye bê girtin; li wî welatî mafê mirovan nîn e, mafê axaftinê nîn e, mafê xwederbirînê nîn e!

Hemîd Dilbihar nivîskar û helbestvanê kurd e û endamê Komeleya Nivîskarên Kurd e. Ew weke nivîskarekî dê bîrdozekê biparêze. Dadgeha ku Hemîd Dilbahar bi 'terorîst'iyê îtham dike, bi biryar û kirinên xwe yên şênber teroristiya herî mezin dike li hemberî merivekî, civakekê û neteweyekê…

Em wekî Enstîtuya Kurdî ya Amedê bangî rayedar û rêveberên dewletê dikin, ku demekê zûtir helbestvan û nivîskar Hemîd Dilbihar bê berdan û lêborîn ji wî, ji raya gişti û ji gelê kurd bê xwestin…

19/09/08/Amed

Enstîtuya Kurdî ya Amedê

Navnîşan: Huzurevleri Mah. Dr. Sıtkı Göral Caddesi
Kalem Sokak No: 32 K: 4 **Kayapınar/Diyarbakır**
WEB: www.kovaraw.con
Tlf-Fax: 0090 0412 237 43 16
E-Mail: enstituamed@hotmail.com